Dûmahî : Dijatî li ser sivîlina, girtinin tewşankî û veşartinek zorane û guhestina girtiyên Kurd ji Hepsa "Maratê", vêrgiya 50% ji berhema zeytûna ya hemwelatiyên ne li wir ji nivîsgehên "abortiyê" re, dizîn û basmîşkirina malan

Û bi ser ku komîta abortiyê di giştînameyek xwe de destpêkirina berefkirina zeytûnên xwarinê li 20.09.2025an. Z û yên guvaştinê jî li 15.10.2025an. Z bêlî kir/sînordar kir, lê hîna jî li ser pêkanîna wê şêwaza bîrokrat ji bo çespandina malmewadaniyê rijd dike, û hemwelatî jî li benda biryarên wê ne.
Ji aliyê xwe ve jî, li 23.09.2025an. Z, çîgirê Parêzvanê Heleb "Ebid El'rehman Selamê" bi beşdariya rêvebirê herêmê û endamên komîta abortiyê, bi dehan hemwelatiyan re li Efrînê civiya, guhdarî li gilî û têbînên wan li ser karê komîta abortiyê kir, û soza hêsankirinê da, lê tu tişt li ser erdê nehat cîbicîkirin, ji bilî pejirandina hin çespandinên malmewdaniyê bi riya bînerdan/ şahid û keyan û belgekirina/ erêkirina rêdankan bi riya Watsapê ji aliyê yên li derve ve.

Komîtên şaxeyî li Navçên "Şiyê, Mabeta, Reco, Şera, Cindirêsê", yên ku endamên komîteyên berê li ba nivîsgehên abortiyê di nav xwe de guncaw dike, ji yên ku piştî roxandina rijîmê vegerîne, daxwaza berzkirina belgeyên nû yên malmewdanan dikin, bi ser dorpêçkirina malmewdaniya ku li şûn xwediyê wê yê mirî maye, û wan xwediyên hemî rêdankan agahdar kirin ku ewê nîvê berhema zeviyên ên li derve (50%) bistînin, bê ku lêçûn û buhaya berhemdankirinê yan dema ku zêtûn werin dizîn berçav bêne girtin.
Ü Komîta "Şiyê, Mabeta" gundên herdu navçan bi wan biryaran û gûmankirina çiqasiya berhema zeviyên hemwelatiyê li derve agahdar kirin, ji bo wergirtina nîvê wê piştî berefkirinê, û herweha Komîta Şera jî bi heman karî rabû.
Û hîna jî "Ebo Kasêr - yê li Gundê Şerqiya rûniştî" û "Ebo El'şêx - yê ku li Gundê Diraqliya rûniştî" ji bermaya Milîseyên "Firqit El'hemzat" dest dîdinin ser sedan zeviyên zeytûna li herdu gundan û gundên hevcîwar biherdu gundan re li Navça Bilbilê, û zeviyên ên piştî roxandina rijîmê vegerîne yan jî yên ku ji aliyên rêdankeran ve têne rêvebirin radest nakin, û hîna jî serkêşekî Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" dest dîdine ser dora /2500/ darî zeytûnê û /1000/darî henarê û malmewdanên komela cotariyan li Gundê "Miskê Jorin" - Navça Cindirêsê.
Û komîtê diyar nekir bi çi yasayê yan bi çi behaneyê wan vêrgiyan li ser malmewdanên yên li derve dide ferzkirin û çawa wê mafên wan biparêze, yan jî ew pereyên van vêrgiyên mezin dê bi kû ve herin, û şêwazek zelal û açiq ji wergirtin û xistina wan vêrgiyan di sindoqa rêvebiriya herêmê de heye, yan jî wê herin berîkên serkêşên milîseyên berê, ji bo razîkirin û xweşbûna dilê wan!؟

Binpêkirinine din:

-Li şeva Înê 12.09.2025an. Z, du dizên serûgirtî mala Hemwelatî "Mistefa Hemîd Hesen /36/sal" ji Gundê "Hesen" - Reco ji bo dizînê basmîş kiririn, û dest bi dijatiya li ser herdu hevjînan kirin, lê xwediyê malê pevçûna wan bi destan kir û ew neçar kirin ku birevin.

-Li şeva Sêşemê 30.09.2025an. Z, giropeke çekdar bi cilên El'emin El'am/Asayêşa Giştî mala Hemwelatî "Xoce Hisên Xorşîd" li Gundê "Kora" - N. Cindirêsê badmîş kir, û bi hêza çekan endamên malê daxistin ser çogan, lê piştî ku cîran pê hesiyan û li dor malê tevgeriyan, giropa çekdar reviya.

-Li dawiya Rezbera/Êlûna borî, giropeke çekdar ji endamên "Ebo Kasêr" - Milîseyên "Firqit El'hemzat" rabû Hemwrlatî "Mihemed Mihemed Horo" ji xelkê Gundê "Qorta" - N. Bilbilê revand, ji ber berefkirina wî zeytûna ji zeviyeke xwe, û çar çiwal (dora 360KG) zeytûnên kesk/hişîn jê birin, û ji bo berdanê jî di heman rojê de hezar dolar wek vêrgî li ser da ferzkirin; "Horo" jî giliyek pêşkêşî El'emin El'am kir, lê bê fêde bû, û bi ser de jî gefin nû ji giropa "Ebo Kasêr" jê re hatin.

-Li 07.10.2025an. Z, dizine rûpeçinandî matoreke dutekerî ye Hemwelatî "Mihemed Beşîr Hiso/ Malbata Xezal" ji hewşa malê li Bajaroka "Kefersefrê" - Cindirêsê dizîn.

-Di navboriya hefta borî de, li Gundê "Çeqelê Cûmê" - Cindirêsê, dizine çekdar matoreke duloqî ye herdu kurên Dilovanber "Ebid El'rehman Cimê" dizîn; Û li 09.10.2025an. Z jî, li dema çûndina wan bo Efrînê da ku giliyekî ji bo dizînê pêşkêş bikin, û sekinandina wan li çateriya Gundê "Enderiyê", giropeke çekdar bi makînak bi navê El'emin El'am hat, ew revandin û matora wan a dudiyê jî dizîn, û ew li nêzîk Gundê "Keferzîtê" yê hevcîwar berdan.

-Bermaya Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" li Gundên "Sindiyankê, Çeqelê Cûmê, Bircikê, Qîlê, Miskê Jorin û Miskê Jêrin" li Navça Cindirêsê, zeviyên zeytûna û malan radestî xwediyên wan ên vegerîne nakin, ta ku bi behaneyên têvel vêrgiyên diravî ji wan wernegirin, û anîndeyên sivîl ên ji wan gundan derketine jî, hemî heyîn, derî û pencereyên malên ku bêtirî heyşt salan dest danîbûn ser dizîn.

-Ji berî dora deh rojan, bermayên Milîseyên "Firqit El'hemzat" rabûn rêbendeke çekdar li çateriya herdu Gundên "Hesen û Qude" çêkirin, da ku hemwemelatiyan tengas bikin û li dema werza zeytûna vêrgiyan li ser wan bidin ferzkirin.

-Di navboriya hefta borî de, giropek jin, ên negîhayî û zarokên anîndeyên çadirgeha di navbera Gundê "Turindê" û Taxa Eşrefiyê li Bajarê Efrînê de diyar bû, ku çawa ew zêtûna ji zeviyên Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa yê hevcîwar rolinîvro didizin, bê ku xwediyên wan wêribin li pêşiya wan bisekinin û nehêlibin dizîn çêbibe, ji tirsa ku ew rastî tuhmetên çêkirî netên; Û dema çûna yekî ji wan bo rêbenda El'emin El'am ji bo agahdarkirinê, endamên rêbendê gotin ew destêwerdanê di tiştekî weha de nakin, û taybet jî diz jin in.
Danûsitandin bi dozên herêmê re bi nêrîneke ewlehî, xemsarî di çareserkirina wan de, û berdewambûna talankirina malmewdanên hemwelatiyên wê, digel gelek binpêkirinan jî, hewildanên hêminiyê li welêt beravêtî dikin, û berpirsiyartiya wê jî "Hikometa Serok Ehmed El'şer'i" hildigire.

.١١،١٠،٢٠٢٥Z - 2637. K

Jêder :

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Dijatî li ser sivîlina, girtinin tewşankî û veşartinek zorane û guhestina girtiyên Kurd ji Hepsa "Maratê", vêrgiya 50% ji berhema zeytûna ya hemwelatiyên ne li wir ji nivîsgehên "abortiyê" re, dizîn û basmîşkirina malan

Destlatên ku ji aliyê Hikometa Şamê ya Demkî ve li ser Herêma Efrînê hatine ferzkirin, ji pêvejoya danûsitandina ewlehî/asayî bi doseyên wê re derneketin, di siya berdewambûna dagîrkeriya Turkiyê de, bi ser hin pêşketinên erênî yên çêbûne de; Piraniya endamên amûra "El'emin El'am/Asayêşa Giştî" û berpirsiyarên wê ji derveyî herêmê ne, û piraniya wan jî ji endamên milîseyên berê yên binpêkirin û tewan kirine ne, û tu pilan ji nûavakirina wê re ji xelkê herêmê jî tune ye, di heman dema ku deriyê derbasbûnê li pêş wan hate vekirin û bi hezaran daxwazên xwe dan, li gel piropagandeke ragihandinî, lê bê ragihandina encamine erênî û bi kêr; Û li destpêka meha Tebaxa borî, girtiyên Kurd (bi tuhmeta partî) ji Hepsa Maratê ya navendî li Efrînê bo Hepsa "Çobanbegê/El'ra'î" - Herêma Babê hatin guhestin, da ku têkeliya wan bi cîhana derve re bê qutkirin, û ta niha çarenûsa wan nediyar e; Û bi dosên vegerandin û birêvebirina malmewdanên xelkê re gerek nirxandina ewletiyê hebe; Û bi dijatiya li ser herdu Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê - Bajarê Heleb a vê dawiyê re, li Efrînê jî giropên gerok û pêngavên ewlekariyê herçûn zêde bûn...

Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:

Dijatiya li ser sivîlina:

-Li êvar 20.09.2025an. Z, sê çekdarên serçavgirtî mala Hemwelatiyê Êzdî "Fetah Elî Mûse /60/sal" li Gundê "Çeqelê Cûmê" - Navça Cindirêsê basmîş kirin, mekin li herdu hevjînan xistin, girêdan, gefa kuştina bi kêrê danê ger giliyekî pêşkêş bikin, paşê jî zêrmêr û pere û xilyewiyên bi wan re dizîn û reviyan.

-Li derdora kat deh ji Êvara Çarşemê 08.10.2025an. Z, piştî bidawîkirina kolandina bîrekê di nav zeviyeke zeytûna ye wî de, li nêzîk Gundê "Çêqilme" li Navça Reco, û vegera wî bo Gundê xwe "Qêsim" yê hevcîwar di riyeke axî re, Hemwelatî "Mihemed Cangîr Dîko /37/sal" rastî dijîtiyek çekdarane hat, ji aliyê du dizên ku zêtûn ji zeviyeke hevcîwar didizîn ve, ji ber ku ew li ber roniya makîna wî hatin dîtin, vêca wan qurşîn bi aliyê makîna wî ve avêtin, ew ji makînê danîn û makîne qulabtin/teqle kirin, paşê jî mekin lêxistin, girêdan û reviyan; Ew jî tevî birîna xwe peya meşiya ta ku gundiyekî wî rastê hatê û ew bire nexweşxaneyeke Efrînê ta ku were dermankirin.

Û li roja din giropeke El'emin El'am li çateriya Bajaroka Mabeta hejmarek ji anîndeyên ku çiwalin ji zeytûna diguhestin Efrînê girtin, û li xwe nan/mikûrkirin ku wan ew tewan û gelek dizînên din ên zeytûnan kirine, û ew tevî malbatên xwe li Gundê "Şêxbila" yê hevcîwar bi "Çêqilme" re rûdinin.

Girtinine bêsûcane:

Amûra Asayêşa Giştî/El'emin El'am li Navça Şiyê hemwelatiyên Kurd ên ku li dema Rêvebiriya Xweser a berê di nav refên "Yekîneyên Parastina Gel û Jin, Asayêş, leşkeriya neçar" de xizmet kirine vexwendin cem xwe, û vêre lêkolîn li ser daxuyanên wan ên kesayetî û karên ku berê pê rabûne çêkirin, û paşê jî ew berdan .

Û li 11.09.2025an. Z, li ser riya vegera wan ji seredaneke ji Bajarê Heleb re bo Efrînê, El'emin El'am herdu xort "Rênas Ebid El'rehman Umer /25/sal, Ebid El'rehman Fewzî Umer /23/sal" ji xelkê Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa li ser matoreke dutekerî girtin, piştî ku xilyewiyên wan kontirol kirin û simbola/ala Hêzên Sûriya Demokrat tê de dîtin, û piştî çar rojan serbest berdan.

Û nûçeyek ji jêdereke pêbawer gihîşte me, ku Asayêşa Leşkerî/El'emin El'am li Efrînê, li navîna Rezbera/Êlûna borî, rastî /11/ hemwelatiyên Efrînê û hin din hatin, li Bajaroka Qitmê - Navça Şera, di hepseke diziyane ye Milîseyên Hêza Hevbeş "Firqit El'hemzat, Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" de, ewên ku ji destpêka heyva Berçileya 2024an. Z ve -dema êrişkirina li ser Herêma El'şehba'i li Gundewarê Heleb a Bakur ji aliyê Milîseyên "Artêşa Nîştîmanî ya Sûrî" ve- hatine revandin; Û ew guhestin Navenda Efrînê, paşê jî ew radestî Şaxa Asayêşa Leşkerî li Bajarê Êzazê kirin. Lê xwediyên hinan ji wan li vê dawiyê li şaxê vegerîn, bê ku kanibin zaroyên xwe bibînin, ji ber ku asayêşê ji nû ve ew veşartin, bê diyarkirina tuhmetên wan. Û ew jî ev in: "Berekat Elî Çolaq ji Gundê Celemê - N. Cindirêsê, Muhemed Nîdal Hisên ji Bajaroka Reco, Canyar Mihemed Kêlo ji Gundê Sorkê - N.Reco, Hisên Cemal ji Bajaroka Meydanekbezê - N. Reco, Qusey Hisên Xelef ji Bajarê Qamişlo, Basêm Miqdad ji Gundê Basilê -

Robariya û ji xwediyên pêdiviyên taybet, Xesan Oso ji Sîvat/Henderat - Bakurê Bajarê Heleb, Mihemed û birayê wî Umer kurên Ibrahîm Mistefa ji Bajaroka Be'idîna - N. Reco, Semîr Nezmî ji Efrînê, Hisên ji Bajaroka Reco"; Herweha "Hêza Hevbeş" jî di demeke berê de beramberî vêrgiyine diravî du hemwelatî serbest berdan, ew jî bi vê giropê re girtî bûn .

Û ji aliyekî din ve, li destpêka heyva Tebaxa borî, Amûra El'emin El'am bi dehan girtiyên Kurd (bi tuhmeta partiyê, berê cezayin giran li ser hatibûn ferzkirin, û hin jî hîn lêkolîn bi wan re dihatin kirin) ji Hepsa Maratê ya Navendî li Efrînê guhestin Hepsa Çobanbegê/El'ra'î li Herêma Babê, da **ku têkeliya** wan bi cîhana derve re were qutkirin, û ta niha çarenûsa wan nediyar e; Û bi sedan ji girtiyên xelkê "Berava Sûrî" jî li şûna wan xistin vê zîndanê.

Werza zeytûna:

Weke rewşeke tucarî nebûye û awerte ji hemî Herêmên Sûriyê, destlata veguhêz li Sûriyê bi mebest komîtek abortiyê ye taybet li Herêma Efrînê çêkir, û rêvebiriya Herêma Efrînê li 18.09.2025an. Z giştînamak derxist, tê de "şêwaza daxwaz û vegerandina mewdanan" da bêlîkirin, mîna berzkirina belgeyên/Dukomentên erd û malmewdanan û digel erêkirina wan ji bal parêzerên binavkirî ji aliyê destlatê ve (parêzer li ser erêkirina her doseyekê 200 lîreyên Turkî werdigire) û di dûre radestkirina wan ji nivîsgeha şaxeyî li navçê re, yê ku ji aliyê xwe ve ji komîta serekîn re dişîne.

Herweha di heman rojê de giştînamak din jî derxist, tê de hemwelatiyan pabend dike ku gerek rêdanka berefkirin an vedan/ bûdekirin/kesixandina zeytûna li ba mixtêr/keyê çêkin, ta ku kanibin di nav zeviyên xwe de kar bikin û berhemên xwe di ser rêbendên ewlehiyê re derbas bikin.

Rûpel 11

Konê Reş: Gotinek Di 47 Saliya Dr. Kamîran Bedirxan de

Xweş e ku em bîranîna Mîr Dr. Kamîran Bedirxan, sê gîsin jî bikim. Wek ku diyar e, roja (04.12.2025), 47 sal di ser koçkirina wî re derbas dibe, xweş e ku em di vê rojê de, li hin şîret û pendên wî vegerin..

Min ev gotinên wî (Ma ne wilo ye), ji rojnameya wî (Stêr), hejmara 3an, sala 1943an, a ku li Beyrûtê bi zimanê Kurdî û Fransî diweşand, girtiye, pêşkêşî we dikim û ez bi xêr û hûn bi selametî. Konê Reş, Qamişlo, 04.12.2025

Fermo bixwînin:

"Ma ne wilo ye?.. Gava qedrê yekî digrî, bîne bîra xwe, ko tu jî mîna wî mirovek î; û xwe di pêşiya wî de zirav me ke. Qedrê mirovên hêja têtе girtin; û mirovên hêja, mirovên mezin in; lê ne hewce ye ko emê xwe bikin ebd û xulamê wan. Yê ko canê xwe hêj nedaye welatê xwe, divê dest ji xebata welatê me kişîne...

Heke tu beg an axayek î; tu çi mirovî; ji halê gundî an koçerên te, têtе seh kirin; heke ew têrin; maline paqij de rûdinin, cilên pak li xwe dikin û hinik xwendin û nivîsandinê dizanin, tu mirovekî pir qenc î; heke gundiyên te, an xelkê eşîra te birçîne, belengaz in, xaniyên pîs de rûdinin; nezan in, tu mirovekî pir xerab î, di pêşiya Xwedê û milet de, berpirsiyar î; û bizane ko tu ji dizan kêmtir î; ji ber ko diz, diz e; û hew; lê tu xwe dikî mezin û hema xwîn û goştê welatiyên xwe dixwî û vedixwî; û heke te ji xwe pirsî ez bi kêrî çi têm; tu ê bibînî ko tu bi kêrî tiştekî nayî û di nezaniya xwe de, gora kur û neviyên xwe dikolî; û wê demê divê tu hişyar bibî, tobedar bibî; û bibî xulam û xidmetkarê milet û welatê xwe; yê ko ev çend sal in kal û kalikên te bi xwedî kiriye û îro jî te bi xwedî dike..

Her wekî tu nezan î, û ji destê te tu xebat nayê, tê bibî perîşan û şerpeze; milet ne guhanên çêlekan e; te ewî dot; lê êdî bes e; divê êdî tu bikêrî vî milet û welatî bê".

Mîr Dr. Kamîran Alî Bedirxan

Belê mîrê min! Wilo ye, gotinên te bi serê xwe rast in.. Hêjî, em ji ber jana ezezîtî û nezaniyê dinal in.. Hêjî, hewcedariya me bi kesên mîna te heye.. Rehma Xwedê li giyanê te be.

Wêne Mîr Kamîran û kebanya xwe di serdanek Kurdên Beyrûtê de sala 1971.

Konê Reş

Dûmahî : Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Hêviya Welêt) (1963-1965)Z. xelek:1

bîrnake ku vê rastiyê jî di ber çavan re derbaz bike û ew dibêje:Hin rewşenbîr jî rolên xwe di pêşketina zimanê Kurdî (Kurmancî) de hene,lê bi texmîna min jî ew dixwaze rolên Mîr Celadet Bedirxan,Kamîran Bedirxan,Cegerxwîn,Osman Sebrî û.h.d di vejandina rêziman û zimanê Kurdî de bi xwendevanên kovarê re bide nasîn.
Komîta rêvebirê kovara (Çiya) dîsan di derbarê giringiya zimanê dayikê de gotara siyasetmedar, şoreşvan,wêjevan Osman Sebrî di bin vê navnîşanê de(Ziman di jîna miletan de) ji pirtûka wî(Derdên me) dibe û di vê hejmarê de diweşîne;Ziman ,ew tiştê ku mirov ji dehban vediqetîne … ,lewra jî zanan gotine (ku Bihayê gel ji pêşveçûna zimanê wî dixweye (diyar dibe),pêşveçûna zimanê miletekî, nîşana xurtî û rûmeta wî ye.) .
Osman Sebrî hîn dibêje:lê mixabin ku hemî zanayên Kurd ji xeynî (bilî) çend camêrên bi rûmet,bi zimanên biyaniyan xwendine û bi wan zimanan kitêb (pirtûk) çêkirine û emrên (temenên) xwe di xizmeta wan zimanan de borandine ,lê Osman Sebrî di jiyana xwe de mîna her mirovekî bîrawer û şoreşger gelek geşbîn e; hêviya pêşketina zimanê Kurdî di dilê wî de şiqin dide, ew hîn dinivîse û dibêje: Ronahiya di çavên xortên Kurd de ji min re hêviyek mezin dibe ku her kes ji wan xwendin û nivîsandina zimanê xwwe baş hîn bibe û bi birayên xwe ên kurd jî bide hînkirin.
Di vê hejmarê de(10)helbest hatine weşandin;1-Qelsok di bin navê (Labût)de,2-Şêrê nezan(Hemreş Reşo),3-Şîrîn welat(Azad Hêvîdar).4-Dicle –Firat(Osman Sebrî),5-Durû(Osman Sebrî),6-Gazin ji Xwedê(Osman Sebrî), 7-Gotina Welat(Cegerxwîn),8-Reş bo azadî(Hemreş Reşo),9-Şam şekir e welat şêrîntir e.(Cegerxwîn),10-kovara Deng (H.Reşo).
Emê li vir tenê wek nimûne li nik hin helbestan rawestin,giringî û armancên wan bi xwendevanan bidin nasîn.
Azad Hêvîdar helbestekê bi (21) malikan di bin navnîşana (Şîrîn welat) de dirêse,emê tenê çend malikên vebjartî li jêr bi we bidin nasîn.
Megrî welatê şîrîn,tu tim di bîra me de yî.
Tucar tu bîra nabî,tim di dilê me de yî.
Li dûr im dengê min nayê te,
Bi dil bawer im ko rojekê bêm ba te.
Menale şîrîn welat menale.
Tu ne bê xwedî û bê kes î.
Rast e Azad Hêvîdar li dervayî welêt dijî,lê ew pir ji dûr de jî nalîna welatê xwe Kurdistan dibhîse û bi wî re stêrên bindestiyê û setemkariyê dibarîne û bi wan jî helbesta xwe li tevnê dixe, bi ser vê de;ew sozê dide welatê xwe ku ewê rojekê li rex wî raweste û ewê bi hev re têkoşînê li dijî neyaran bikin.
Di vir de Osman Sebrî sê helbestên xwe pêşkêşî xwendekarên (Hêviya Welêt) dike:1-(Dicle û Firat),2-(Du Rû), 3-(Gazin ji Xwedê):Diyarî ye ji Fa-îq Bucaq r e.
Şopînerên siyasî baş zanin ku Apo Osman Sebrî şoreşvan û siyasetmedarekî navdar û payebilind bû,ew ji Kurdistana Bakur ji ber hêriş û setemkariyên destlata Turkiyê bê dilê xwe koçberî Rojavayê Kurdistanê bûye,lê herdu çemên Kurdistanê ji dilê wî venaqetin,ew baş dizane Melê Cezîrî û Ehmedê Xanî jî evîndarên herdu çemên bêzar bûn.
Osman Sebrî di bin vê navnîşanê (Dicle-Firat) de (18) malikên watedar dinivîse û em li vir çar malikan tenê ji wan pêşkêşî xwendevanan dikin. (Nizanim bû çiqas bê dilê xwe dûrî welêt im
Ji dil û kezeb evîndarê Dicle- Firat im
Melê Cezîrî Îlhama xwe ji wî çemî distand
Ehmedê Xanî jî serekî ava wî vexwar.….)
Osman Sebrî mîna her kesekî dilsoz û rastgo neyarê kesayetiyên duruyî bû, ewî nedixwast rastiyan bi derewan bipeçine,keysebazî di hiş û nirînên wî de nikanîbû cihê xwe bistîne,ewî dixwast nêrînên xwe mîna ava kaniyên zelal di hişên mirovan de biherike,lewra jî di bin vê navnîşanê (Durû) de (23) malikn dinivisîne,em tenê yên jêrîn bi xwendevanan didin nasîn:
(Ho reha çepel ! Tev girêk û xar
Ji rûçikên çak hemiyan bêpar
Dilê te qirêj bes ziman bedew
Naşî bibêje tu gotina rast
Dikarî bêjî (reş e rengê mast)
Lê di vê hejmarê de du helbestên Seydayê mezin Cegerxwîn hatine weşandin1- Di bin navnîşa (Gotina Welêt) de bi 30 malikan e.2-Şam şekir e welat şêrîntir e bi (57) malikan e.
Cegerxwîn di naveroka helbesta (Şam şekir e û welat şîrîntir e) de evîndariya xwe ji Kurdistanê re gelek bi zelalî ji xwendevanên xwe re dide xûyakirin û ew bi baweriyek mezin rêşalên evîna welêt di dilên xwendvanên xwe de diçîne û bi hestên Mîrê helbesta
Kurdî Ehmedê Xanî giyanê gelê xwe av dide,erê! Cegerxwîn ji hemû gelên cîhanê hez dike,li nik wî hemû miletên cîhanê şekir in,lê Kurdistana bedew û bindest hîn şîrîntir e.
Emê tenê çend malikên vebjartî li jêr pêşkêşî xwendevanan bikin .
(Welatê min tu bûyî bûka cîhanî
Hemî bax û bihişk û mêrg û kanî
Şepal û şeng e û şox û naz û gewr î
Gelek şêrîn û rind û pir ciwan î
Cegerxwîn e kurê te her dinalî
Ji ber jana nezanî û xizanî .
…..).
(Sewra Azadî,dîwan 2)
Wek me di destpêka gotibû(Hêviya Welat)ne tenê berhemên çandî û wêjeyê ji xwendevanên xwe re diweşîne;ewa zimanê xwendekarên Kurd e Jî li Ewropa ye û me berê jî gotiye:Tevgera xwendekarên Kurd li Ewropa beşek ji tevgera azadîxwaza Kurdistanê ye,lewra em di vir de daxûyaniyekê jî di bin navnîşana (Bang ji bona azadîxwazên û komîteya mafên cîhanê de) dixwînin.
Di vir de (Yekitiya xwendekarên,mamostên,xortên û jinên Kurdistanê) di vê daxûyaniyê de bang dikin û bi vê wateyê dibêjin:Hukumeta Besî a faşist bi hezaran zarok,jin kalên Kurdistanê bi bombên(Napalim) dixin bin tirsa wendakirina tevayî.Herweha jî daxûyanê bang li komîta mafên mirovan dike û dibêje:Ku nûnerê Kurd ji bo danûstandinê salih Yosifî û hevalên wî yên din ji zîndanê werin azadkirin,herweha jî di vê daxûyanê de şêweyên dirindane di zîndanên Îraqê de têtin cersandin.
Herweha em dikanin di vê hejmarê de çîrokek folklorî jî di bin navnîşana (Sîr ûPîvaz)de bixwînin,ewa jî ji kovara(Ronahî) (1942-1945) sernivîserê wê Mîr Celadet Bedirxan hatiye wergirtin,li vir em pir pêwîst nabînin ku em li ser naveroka wê jî rawestin .

Dûmahîk heye

Dr.Ebdilmecît Şêxo : Rola Kovara (Hêviya Welêt) (1963-1965)Z. xelek:1

Kovara (Hêviya Welêt) jî beşek ji dîroka çapemeniya Kurd e; ewa zimanê fermî ya (komela xwendekarên Kurd li Ewropa bû), komele jî beşek ji tevgera azadîxwaza Kurdistanê bû,sernivîserê vê kovarê jî welatparêz û siyasetmedarê gewre nemir Hemreşê Reşo bû.Hejmara yekê di meha Razberê,sala (1963) an de ronî dîtiye û hejmara sisiyê û ya dawiyê di Newroza,sala (1965) an de hatiye weşandin.

Hemreş Reşo di pêşgotina berhevoka sê hejmaran de dinivîse:Min sernivîsera kovarê berda,lewra jî komîtek nûh bi serkêşiyê Şefo hate damezrandin,lê mixabin komîta nûh nikanîbû di weşandina kovara (Hêviya Welêt) de berdewam bikira.

Herweha Dr.Nuredîn Zaza jî di pêşgotina berhevoka van sê hejmaran de dinivîse: Kovara mehane(Dengê Kurdistan),dengê yekemîn ya (Xwendekarên Kurd li Ewropa bi tîpên Latînî di salên (1949-1950) dihate weşandin.

Dr Nuredîn Zaza hîn dinivîse:Tevgera xwendekarên Kurd di sala (1956) an de sernûve hate vejandin û (kovara Kurdistan) bûye deng û zimanê tevgera xwendekarên Kurd,lê piraniyên gotarên vê kovarê bi zimanê Êngilîzî bûn û yên mayîn bi Kurdî,zaravê Soranî bûn.

Lewra jî Hemreş Reşo kovara (Hêviya Welêt) di sala (1963) an de bi zimanê Kurdî (Kurmancî) wek deng û zimanê (Komela xwendekarên Kurd) li Ewropa derxist.

Di hersê hejmarên kovarê de,helbest,çîrok, pend û şîret, gotarên siyasî û dîrokî bi pênusên navdar mînanî Osman Sebrî,Cegerxwîn,Dr.Îsmet Şerîf Wanlî,Hemreş Reşo, hatine weşandin.

Dr.Îsmet Şerîf Wanlî di bin navnîşana (Hêviya welêt) de gotarek dirêj dinivîsne,ew dibêje:Derxistina (Hêviya Welêt) bi zimanê Kurdî bi zaravayê Kurmancî (ê Bakur) bi tîpên Latînî,ew bi xwe bûyînek mezin e ji bona çanda nîştimaniya Kurd a nû…., hêvî ew e ku Hêviya welêt bi gotarên xwe ve ,derketina wê li dû hev dê valabûnê di warê çanda nîştimaniya kurd dagre ,ji ber ewa bi zaravayê kurmanî ê şêrîn derdikeve ê pirbûna miletê kurd pê dipeyve (di kurdistana Turkiyê de ,Sûriyê ,,Yekitiya Sovyet û perçên din ji Kurdistana Îraqê û Îranê ,ew hîn dinivîse :Zaravayê Kurmancî zi manê ehmedê Xanî ê bilind e yê ku di sed sala (17) an de hatibû dinê, lê (Hêviya Welêt) kovareke çandî û ne siyasî ye,lê tevî vê;Î.Ş.

Wanlî pêwîst dibîne ku di hejmara Pêşîn de ew hinekî li ser siyasetê û rewşa gelê Kurd raweste,ew bi kurtî wisa dinvîse:Nîştîmanekî zor lê tê kirin,mafên wîna jê hatine standin,welatê wî hatiye perçekirin,şoreşa pêşverû ji sala 1961 ê de li Kurdistana Îraqê li dijî dîktetur Gêneral Qasim vêketiye û leşgerên şoreşvanên Kurdistanê(Pêşmerge)di bin rêveberiyê qehremanê miletê Kurd Gêneral Mustefa Barzanî de êrişa bêbext rawestand .

Siyasetmedar hîn dixwaze bi van agahiyên jêrîn jî wireyên xwendekar û xwendevanên kovarê bilind bike û germbûna netewayetî di tamarên wan de biherîkîne;ew dibêje:Piraniyên miletên cîhanê nola Firansizan,Swêsrî Îtalî,Alman, Lubnanî, Sovyetî,Çêkî,Mengolî û herweha rojnamên cîhanî û îzgeh û televîzyon bi giranî didin dû nûçeyên cenga Kurdistanê.

Nivîskarê gotarê ne tenê li ser Kurdistana Başur disekine,lê ew rewşa siyasî û bindestiya gelê Kurd li sê beşên din jî baş di ber çavên xwendevanên kovarê re derbaz dike,herweha jî Dr.Î.Ş.Wanlî dixwaze ku (Hêviya welat)guhdanê li dîrok û wêjeya Kurdî jî bike.

Hemreş Reşo carek din erk û armancên Xwendekarên Kurd li Ewropa bi bîra xwendevanên

(Hêviya Welêt) tÎne û ew kêse weha dibêje:Xurtkirina danûstandinê di nav xwendevanên Kurd de,vejandina çanda netewa Kurdî,danasîna Kurdistanê bi cîhanê,piştvaniya têkoşîna miletê Kurd û hemû miletên cîhanê.

Herweha jî sernivîserê kovarê mijarek din di bin navnîşana (Hêvî) de diweşîne;ew bi gelemperî li ser hêviya welatan û bi taybetî yên bindest weha dinivîse:Welatên cîhanê çar bend in1-Welatên bi her awayî pêşveçûyî ne.2-Welatên ku di rûnê xwe de têne qewrandin û birajtin.3-Welatên paşda mayî .4-Welatên bindest û bê maf dijîn.

Bê guman mebesta wî di vir de, ku gelê Kurd ji welatên bindest e û ew bê mafên netewî ye,hêviya gelê kurd jî ku ew mînanî gelên din di bin nêrê zordar û dagîrkeran de rizgar û serbest bibin û ew hîn bi van gotinên jêrîn hestên xwendekar û xwendevanên kovarê germtir dike û dibêje:Di sedsala bîstan de mirov di bin destê mirovan de ye,nizanim tiştek ji vê dijwartir heye ku Mirov kolê mirovan be.

Herdîsan Soro jî gotarek giring li ser giringiya zimên di bin vê navnîşanê de (Pêwîstiya pêşvebirina zimên) bi vê wateyê dinivîse:Pêşdaçûna zimên yanê; pêşveçûna milet e û eger em li zaravê Kurmancî binêrin,emê tê da gelek kêmaniyan bibînin, ev jî ji gunehê bav û kalan e,zana û şehrezayên me jî ji bo pêşvebirina zimanê bav û kalan xwe nedîşandin.**Lê Soro ji**

Rûpel 14

Jiyana Bavê Selah bi kurtî

Bavê Selah di sala 1952an de li gundê Gurda, herêma Efrînê ji dayîk bûye. Di destpêka zaroktiya xwe de fêrî stranan dibe. Diya Bavê Selah ew fêrî stranan dikir ji ber ku wê gelek stran ji bavê xwe (Îbramê Tirko) li ezber kiribûn, bandora dayika wî gelekî lê bibû û her wiha li gundê Gorda Oda dengbêjan hebû li wir gelek dengbêj dihatin û sitran digotin.

Dema temenê Bavê Selah dibe 9 salî, ew her roj diçe gundê Kora ji bo ku fêrî Amûra tembûrê bibe li ber destê Adîkê.

Wek ku tê gotin Bavê Selah di demeke kurt de fêrî tembûrê dibe, Bavê Selah bi rengekî fermî dest bi strana kir û di şahiyên gundê xwe de û li herêmê wî stran û şevbihêrk li dar dixistin.

Ji ber ku rewşa diravî ya Bavê Selah ne baş bû, ji gundê xwe Gorda bardike û berê xwe dide bajarê Helebê û li wir dest bi karê hesinkariyê dike.

Li Helebê di sala 1984 de Bavê Selah tevlî Koma Armanc dibe û bi hevalên xwe re yên di Koma Armanc de dest bi tomarkirina kasêtan dike û di kasêta 4 çaran de Bavê Selah dastana Delal tomar dike û gelekî deng dide.

Wek ku tê zanîn Bavê Selah ji bilî stranan, helbestan jî dinivîsîne. Tevî ku tu dezgeh tinene ku kultûr û destanên kevnar biparêzin û binivîsînin, Bavê Selah her çend sala kasêtek tomar dikir bê ku tu kes alîkariya wî bike.

Bavê Selah di jiyana xwe de çend caran tê binçavkirin û wî dixin zindanê. Cara dawiyê 2 heyvan di zindanê de dimîne.

Bavê Selah seredana Ewropayê jî kirî û li Ewropa gelek konser û şevbihêrk li dar xistine, herwiha li welatin din wek : Libnan, Urdin, Rûsiya, Îmarat û kurdistana başûr û bakor li şahî û newroza beşdar bûye Jiyana Bavê Selah û rewşa ku ew tê re derbas bûye



gelekî zehmet bû lê pir bihêz bû û ne diwestiya.

Bavê Selah gelek stran û kasêt tomar kirine wek, Delal, Cebelî, Şêx Seîd, Dewrêşê Ebdî, Xec û Siyamend, Gênc Osman, Heycanê, Bavê Koroxlî û gelek stranên folklorî dane sitranbêjan.

Bavê Selah komek zarokan damezrand û kasêtek ji wan re tomarkir bi navê (Koma perwane)

Her wiha Dîwanek wî yê helbesta jî heye bi navê (Landika min)

Bavê Selah di roja 14, 7 , 2016 an de koça dawî dike li bajarê Efrînê û wî vedigerînin gundê Gorda binax dikin.

Hişmend Şêxo: Salek diser rûxwendina rêjîma Esed re

" Nerînek di derbarê rewşa Sûrî de"

Di sala 2011an de qeyrana Sûrî destpêkir û ji wê demê de ji ber zihniyeta rêjîmê û nepejirandina wê ji daxwazên hemû pêkhateyên gelê sûrî re di gorankarî û çaksaziyê de û li şûn sivikirina êş û azara welatiyan û dayîna azadiyên giştî , rabû bijardeya leşkerî hilbijart û hemû xwepêşanderên azadîxwaz girtin û Sûriyê ber bi leşker kirin û şerê navxweyî de bir û hemû çekên xwe yên giran li dijî pêkhateyên civaka Sûrî bi karanîn.
Berî bi salekê di / 8 / 12 / 2024an de rêjîma Be's hate rûxwendin û di berbanga wê rojê de serokê wê rêjîmê Beşar El Esed ji Sûriyê reviya û bi balafireke taybet giha dewleta Rûsiyayê û desteya rizgariya Şamê welat birêve bir, di wê roja dîrokî de hemû pêkhateyên civaka Sûrî daketin kolanan û kêfxweşiya xwe derbirandin ku ji vê rêjîma zordest xilas bûn û li hêviya rojeke geş û welatekî demoqratin, ji aliyê xwe ve û bi hesretên partîzan û şervanan gelê kurd jî ev şahiya hembêz kir lê zor mixabin heya bi vê rojê û di vê bûyera dîrokî de dîsan kurd hejar û xemgîn bûn ji ber ku careke din kurdên Efrîna berxwedêr ji Şehbayê hatin koçber kirin û hiştin ku wan nerînên hêvîdar û li bendewariya vegerê jar bibin û ew çavên ku li azadiyê dinêrin hîn zêdetir biwestin.
Piştî rûxwendina rêjima dîktator tiştê ku îro em dibînin û tevî zehmetî û nehêsan bûna wê lê ji her demê zêdetir tekez dike ku divê gelê Sûrî xwe ji wan çandên kevnare û kevneperest xwe rizgar bike ji ber ku wan temenekî buha dan , û ji her kesî zêdetir gelê kurd ziyaneke mezin ji wê siyasetê dîtiye ji ber ku her carê daxwaza mafê xwe dikir yekser dihat girtin û bi parçekirina beşekî ji xaka Sûrî dihate tawanbarkirin , û bi dirêjahiya desthiladariya wan tu carî vê rêjîma nijadperest venasîneke fermî bi hebûna gelê kurd li Sûriyê nekir û herdem berdewam bûn di siyasetên xwe yên regezpetestî , erbebkirin û pişaftina kurdan de. Îro Sûriyê ji wê desthilata zordar bidawî bû ku wê rêjîmê welat kiribû şanoyek ji destwerdanên navdewletî û herêmî re. Lê Mixabin ji destpêka ku desteya rizgariya Şamê giha ser deselatê bêyî ku li tevgera rêzanî ya Sûrî , komele , rêxistinên mirovan û li nûnerên pêkhateyên civaka Sûrî vegere gavên yek alî girtin destpêka wê lidarxistin kongireya serkeftinê bû, piştre lidarxistina kongireya nîştimanî ya ku ji yek rengî pêkhatibû, piştre ragihandina makezagonî ya ku hêviyên gelê Sûrî sêdar kirin, herwiha ji bilî kiryar û binpêkirinên ku li berava Sûrî û Siwêdayê hatine kirin, û destnîşankirinan endamên encûmena gel bi şêweyekî dûrî pirensîbên dîmoqratiyê, herwiha dagirtina mizgotineke kîndariyê li dijî gelê kurd û herêmên kurdî dikin.
Mirov dikare bêje ku bi dirêjahiya mewdaya salekê ye hikûmeta veguherîna herî zêde girîngiyê dide peywendiyên navdewletî û herêmî û ta radeyeke baş têde bi serket û karîbû hin sezayên aborî ji ser Sûriyê rake lê ev bi tenê têrê nake, raste peywendiyên rêzanî û aborî û dîplomasî bi hêzên navdewletî û herêmî re girîngin, lê belê ya girîngtir ewe çareserkirina pirsgirêkan û xurtkirina bereya hundirîn e, lewre pewîste ku hikûmeta veguhêz lêvegereke giştgîn ji helwest û siyasetên xwe re bike û divê di zûtirîn dem de kongireyekî nîştimanî Sûrî were lidarxistin ku nûnerên hemû pêkhateyên civaka Sûrî têde beşdar bin, û ji wî kongireyî komîteyek damezrêner ji bo dariştina makezagoneke nûjen were sazkirin daku şêweyê xwezaya deselatê di welêt de destnîşan bike bi sazkirina rêjîmek demoqratî, hemelayen û nenavendî daku mafên hemû pêkhateyên civaka Sûrî têde parastî bin.

Divê çarçewê de divê hemû xalên "Rêkeftina Dehê Avdarê" ya di navber serokê hikûmeta veguhêz Ehmed El şer' û cinêral Mezlûm Ebdî fermandarê giştî ya Hêzên Sûriya Demoqrat de werin cîbicîkirin ji bo pêkanîna tevlîhevkirina giştgîn li ser astên ewlehî û rêzanî û rêveberî, û nadar kirina mizgotina kîndariyê di navbera Sûriyan de.
Herwiha û di zûtirîn dem de divê danûstandin di navber hikûmeta veguhêz a Şamê û şandeya kurdî de dest pê bikin, û divê kar li ser peydakirina çareseriyeke demoqrat û dadmend ji doza kurdî re li Sûriyê were kirin û venasîn bi hebûna gelê kurd û mafên netewî yên kurdî di makezagona welêt de were kirin ji ber ku doza Kurdî li Sûriyê dozeke Nîştimanî Sûrî ye.
Di dawiyê de hêjayî gotinê ye ku em bêjin ev çax û rûpela reş ji dîroka welatê me çû , lê tu carî Sûriya nû ava nabe ku em xwe ji vê çanda kevnare û kevneperest rizgar nekin , herwiha divê ku em waneyekê ji van siyasetên çewt bigrin û çi desthilatên ku di rojên pêş de werin ava kirin divê vê mijarê di ber çavan bigire , divê siyaseteke hişmend were girtin, daku her pêkhateyek bi şêwazekî demoqrat û li gor sîstemeke nenavendî rêveberiya herêma xwe bike , ji ber ku Sûriyê welatekî hemereng û pir netewe û tu carî siyasetên yekreng û regezperestî wê li ser kesî neyê sepandin.

Heleb / 10 / 12 / 2025 Z - 2637 K

****Endamê Komîta Navendî ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê***

Serokê Sûriyê El-Şeri’ Di derbarê Welatiyên Kurd ên Sûriyê de Mersûmek Derxist

Şam -SANA
Serok Ehmed El-Şeri’ mersûma hejmar (13) ya sala 2026an derxist. Ev mersûm tekez dike welatîyên Kurd ên Sûrîyê parçeyekî bingehîn û resen ji gelê Sûrîyê ne û nas-nameya wan a çandî û zimanî parçeyekî jêneger ji nas-nameya nişтimanî ya Sûrî ya pirreng û yekgirtî ye.

الجمهورية العربية السورية
SYRIAN ARAB REPUBLIC

المادة (٦): تلتزم مؤسسات الدولة الإعلامية والتربوية بتبنّي خطاب وطني جامع، ويُحظر قانونًا أي تمييز أو إقصاء على أساس عرقي أو لغوي، ويُعاقب كل من يُحرّض على الفتنة القومية وفق القوانين النافذة.

المادة (٧): تتولى الوزارات والجهات المعنية إصدار التعليمات التنفيذية اللازمة لتطبيق أحكام هذا المرسوم كل فيما يخصه.

المادة (٨): يُنشر هذا المرسوم في الجريدة الرسمية، ويُعد نافذاً من تاريخ صدوره.

أحمد الشرع
رئيس الجمهورية العربية السورية

الجمهورية العربية السورية
SYRIAN ARAB REPUBLIC

المرسوم رقم (١٣) لعام ٢٠٢٦

رئيس الجمهورية

بناءً على أحكام الإعلان الدستوري،

وعلى مقتضيات المصلحة الوطنية العليا،

وعلى دور ومسؤولية الدولة في تعزيز الوحدة الوطنية وإقرار الحقوق الثقافية والمدنية لكافة المواطنين السوريين،

يرسم ما يلي:

المادة (١): يُعد المواطنون السوريون الكرد جزءًا أساسيًا وأصيلاً من الشعب السوري، وتُعد هويتهم الثقافية واللغوية جزءًا لا يتجزأ من الهوية الوطنية السورية المتعددة والموحدة.

المادة (٢): تلتزم الدولة بحماية التنوع الثقافي واللغوي، وتضمن حق المواطنين الكرد في إحياء تراثهم وفنونهم وتطوير لغتهم الأم في إطار السيادة الوطنية.

المادة (٣): تُعد اللغة الكردية لغة وطنية، ويُسمح بتدريسها في المدارس الحكومية والخاصة في المناطق التي يُشكّل الكرد فيها نسبةً ملحوظةً من السكان، كجزء من المناهج الاختيارية أو كنشاط ثقافي تعليمي.

المادة (٤): يُلغى العمل بالقوانين والتدابير الاستثنائية كافّة التي ترتبت على إحصاء عام ١٩٦٢ في محافظة الحسكة، وتُمنح الجنسية السورية للمواطنين من أصول كردية المقيمين على الأراضي السورية جميعهم، بمن فيهم مكتوم القيد، مع مساواتهم التامة في الحقوق والواجبات.

المادة (٥): يُعد عيد "النوروز" (٢١ آذار) عطلة رسمية مدفوعة الأجر في أنحاء الجمهورية العربية السورية كافّة، بصفته عيدًا وطنيًا يعبر عن الربيع والتآخي.

دمشق ٢٧ رجب ١٤٤٧هـ - ١٦ كانون الثاني ٢٠٢٦ م.

Naveroka mersûmê:
Serokkomar
Li gorî bendên Danezana Destûrî û li gorî pêdivîyên berjewendîya nişтimanî ya bilind; û li ser bingeha rol û berpirsyarîya dewletê di xurtkirina yekîtîya nişтimanî û çespandina mafên çandî û medenî yên hemûwelatîyên Sûrîyê.
Ev biryar hatin girtin:
Madeya (1): Welatîyên Kurd ên Sûrîyêparçeyekî bingehîn û resen ji gelê Sûrîyê tên hesibandin. Nasnameya wan a çandî û zimanî parçeyekî jêneger ji nasnameya nişтimanî ya Sûrî ya pirreng û yekgirtî ye.
Madeya (2): Dewlet pabend e bi parastina cihêrengîya çandî û zimanî û mafêwelatîyên Kurd di vejandina mîrat û hunerên wan û pêşxistina zimanê wan ê dayikêdi çarçoveya serwerîya nişтimanî de misoger dike.
Madeya (3): Zimanê Kurdî wekî zimanekî nişтimanî tê hesibandin, û destûr tê dayîn ku di dibistanên dewletê û yên taybet de li wan deverên ku Kurd rêjeyeke berbiçav ji nişтecihan pêk tînin were hînkirin, wekî parçeyekî ji bernameyên xwendinê yên bijarte yan jî wekî çalakîyeke çandî ya perwerdehîyê.
Madeya (4): Kar bi hemû yasa û tedbîrên awarte yên ku ji serjimêrîya sala 1962an li Parêzgeha Hesekê derketibûn tê betalkirin, û hemwelatîbûna (regeznameya) Sûrîyê ji bo hemû welatîyên bi koka xwe Kurd ên ku li ser xaka Sûrîyê dijîn tê dayîn, di nav de “Mektûm el-Qeyd” (yên qeydnekirî), bi wekhevîya wan a tam di maf û erkan de.
Madeya (5): Cejna **“Newrozê”** (21ê Adarê) li seranserê Komara Erebî ya Sûrîyê wekî bêhnvedaneke (betlaneyeke) fermî ya bi mûçe tê hesibandin, wekî cejneke nişтimanî ku nîşana bihar û biratîyê ye.
Madeya (6): Sazîyên dewletê yên ragihandinê û perwerdehîyê pabend in bi pejirandina gotareke nişтimanî ya giştgir, û bi yasayê her cure cudakarî an dûrxistina li ser bingeha nijadî yan zimanî tê qedexekirin, û her kesê ku fitneya neteweyî sor bike li gorî yasayên berkar tê cezakirin.
Madeya (7): Wezaret û alîyên peywendîdar berpirsên derxistina rênimayîyên bicîhkirinê yên pêwîst in ji bo sepandina bendên vê mersûmê, her yek li gorî taybetmendîya xwe.
Madeya (8): Ev mersûm di rojnameya fermî de tê weşandin û ji dîroka derketina wê ve dikeve ware cîbicîkirinê de.

Ehmed El-Şeri’
Serokê Komara Erebî ya Sûrîyê
Şam 27ê Receba 1447an – 16ê Kanûna Duyem a 2026an.

Jêder : Malpera Sana ya fermî

Ehmed El-Şeri' ji Mesûd Barzanî re: Mafên Kurdan yên neteweyî, siyasî û sivîl, hatine garantîkirin

Serok Ehmed El-Şeri' bi Serokê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mesûd Barzanî re bi rêya telefonê axivî û di wê hevdîtinê de li ser pêşketinên dawî yên li herêmê û rêbazên xurtkirina aramî û ewlehiyê axivîn.
Di vê hevdîtinê de, Serok El-Şeri' piştrast kir ku hemû mafên Kurdan, tevî mafên wan ên neteweyî, siyasî û sivîl, hatine garantîkirin. Barzanî piştgirîya xwe ji bo peymana dawî ya di navbera hikûmeta Sûriyeyê û Hêzên Demokratîk ên Sûriyeyê de nîşan da.
Herdu alî li hev kirin ku hevrêzî û şêwirmendiyên hevbeş bidomînin da ku aştî û ewlehî li herêmê misoger bikin û nakokiyan bi awayekî ku xizmeta berjewendiyên hemûyan bike çareser bikin.

BANG! - Hevkariya Partiyên Siyasî yên Kurd li Fransayê

Hevkariya Partiyên Siyasî yên Kurd li Fransayê, li ser karesata mirovî ya ku niha li Sûriyeyê diqewime bang dike: Taxên Kurdan - bi taybetî Eşrefiyê, Şêx Meqsûd, Dêr Hafir û herêma Bendava Tişrîn - niha dorpêçkirî ne û rastî êrîşên dubarekirî tên.
Her çend sala par di navbera Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) û hikûmeta Sûriyeyê de ji bo dûrketina aloziyan rêkeftinek hatibe çêkirin jî, "hikûmeta demkî" ya li Şamê mixabin rêya şer hilbijartiye .
Hêzên girêdayî rejîmê û her weha hêzên ji aliyê dewleta Tirkiyeyê ve hatine birêxistinkirin, di heremê de aloziyan derdixin û rêya diyalogê dixetimînin .
Di du rojên borî de mirin û gelek birîndar hene. Nexweşxane kêmasiya derman, xwîn û pêdiviyên girîng hene. Rewşa mirovî pir xirab e û her ku diçe xirabtir dibe.
Em dixwazin bînin bîra we ku ev polîtîkayên tundûtûjiyê berê jî li dijî civakên din - bi taybetî li dijî Durzî û Elewiyan - hatibûn kirin. Niha jî li dijî Kurdan tên kirin.
Ev kiryar binpêkirineke cidî ya qanûna mirovî ya navneteweyî ye.
Em bang li rayedarên Fransî û dû re jî li civaka navneteweyî dikin ku bi lez û bez tevbigerin da ku sivîlan biparêzin, dorpêçan rakin, êrîşan rawestînin û gihîştina tavilê ya alîkariya mirovî leztir bikin.
Divê jiyan û rûmeta sivîlan bêne parastin.

Bi giyan û vîna Rojnameya Kurdistan Em xebata xwe dikin

Ji bo belgekirina binpêkirinên ku li Efrînê dibin û ji bo pêşxistina rojnamegeriya kurdî Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû li benda gotar , belgekirin , hest û nerînên we ye.

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Pêşverû
Siyasî . Çandî . Gîştî

Rojnameya Pêşverû Dengê miletê kurd e
Dengê Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ye

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar* (97-98) *Çile 2026Z - 2638 K

Dengê Pêşverû

Berî bi salekê di / 8 / 12 / 2024an de rêjîma Be's hate rûxwendin û di berbanga wê rojê de serokê wê rêjîmê Beşar El Esed ji Sûriyê reviya û bi balafireke taybet giha dewleta Rûsiyayê û desteya rizgariya Şamê welat birêve bir, di wê roja dîrokî de hemû pêkhateyên civaka Sûrî daketin kolanan û kêfxweşiya xwe derbirandin ku ji vê rêjîma zordest xilas bûn û li hêviya rojeke geş û welatekî demoqratin, ji aliyê xwe ve û bi hesretên partîzan û şervanan gelê kurd jî ev şahiya hembêz kir lê zor mixabin heya bi vê rojê û di vê bûyera dîrokî de dîsan kurd hejar û xemgîn bûn ji ber ku careke din kurdên Efrîna berxwedêr ji Şehbayê hatin koçber kirin û hiştin ku wan nerînên hêvîdar û li bendewariya vegerê jar bibin û ew çavên ku li azadiyê dinêrin hîn zêdetir biwestin.

Mirov dikare bêje ku bi dirêjahiya mewdaya salekê ye hikûmeta veguherîna herî zêde girîngiyê dide peywendiyên navdewletî û herêmî û ta radeyeke baş têde bi serket û karîbû hin sezayên aborî ji ser Sûriyê rake lê ev bi tenê têrê nake.

Di vê çarçewê de divê hemû xalên "Rêkeftina 18 Çile ya 2026an" ya di navber serokê hikûmeta veguhêz Ehmed El şer' û cinêral Mezlûm Ebdî fermandarê giştî ya Hêzên Sûriya Demoqrat de werin cîbicîkirin ji bo pêkanîna tevlîhevkirina giştgîn li ser astên ewlehî û rêzanî û rêveberî, û nadar kirina mizgotina kîndariyê di navbera Sûriyan de. Herwiha û di zûtirîn dem de divê danûstandin di navber hikûmeta veguhêz a Şamê û şandeya kurdî de dest pê bikin, û divê kar li ser peydakirina çareseriyeke demoqrat û dadmend ji doza kurdî re li Sûriyê were kirin û venasîn bi hebûna gelê kurd û mafên netewî yên kurdî di makezagona welêt de were kirin ji ber ku doza Kurdî li Sûriyê dozeke Niştimanî Sûrî ye.

25 / 1 / 2026 Z - 2638 K

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Dr. Berhem Salih posteke bilind a cîhanî werdigire

Dr. Berhem Salih posta Komîserê Bilind ê Penaberan ê Neteweyên Yekbûyî werdigire. Antonio Guterres, Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî; Serokkomarê berê yê Êraqê Berhem Salih ji bo postê Komîserê Bilind ê Penaberan ê Neteweyên Yekbûyî destnîşan kir.

Komîserê Bilind ê Penaberan ê Neteweyên Yekbûyî (UNHCR) saziyeke payebilind a Neteweyên Yekbûyî ye ku berpirsiyarê çavdêriya hewldanên navneteweyî ye ji bo parastina mafên bi mîlyonan penaber û kesên bêwar li çaraliyê cîhanê.

Em dixwazin bi ewlehî vegerin Efrînê

Rojnameya Pêşverû

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Gîştî

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye
Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين